

Pîrozbahiyên Newrozê bi coş berdewam dikin **FOTO**



Netkurd
NETKURD
Aktuelbûn: 14:19 - 23/3/2009

Kurdistanî çî li welêt çî li dervayî welêt jî bo Newrozê li ser piya ne. Newroz li Wan, Silopî, Hamburg û Hanovverî jî bi coş hat pîrozkirin.

Newroza îsal bi coşek mezin û beşdariya sedhezaran kurdî bi pîrozbahiyên li salon, mitîng û xwepêşandanan berdewam dike.

Li Kurdistana bakur, piştî Amedê li Wanê jî bi sedhezaran kurd beşdarî pîrozbahiya Newrozê ya DTP-ê bûn. Newroz li bajar û navçeyên Kurdistanê û herweha li navendên Ewrûpayê jî bi coş tê pîrozkirin.

Li bajarê alman Hanovverê bi dehhezaran kurd roja Şemiyê derketin kolanan û ji bo serokê PKK-ê Abdullah Ocalanî doza azadiyê kir. Di pîrozbahiyên Wan û Silopiyiyê jî ku ji aliyê DTP-ê va hatibûn lidarxistin di axaftinan de hat xwestin ku dewlet ji bo çareseriyê pîrsa kurd Ocalanî mixatab bigre û wî serbest berde. Newroz Hanovverê jî aliyê saziyên nêzî PKK-ê hat lidarxistin û piştî demek dirêj cara yekê hunermendê bi navûdeng Şivan Perwer jî beşdarî çalakîyek pkkiyan bû.

HAK-PAR-ê jî li Amedê şevê pîrozbahiyê lidarxist. Di şeva HAK-PAR-ê de jî coş hebû û serokê wê Bayram Bozyel axaft û li ser rola HAK-PAR-ê ya di hîlbijartinê de û Konferansa kurd rawestiya. Bozyel got; divê kurd di vê Konferansê de werin gel hev û pêşaroja xwe bi hev re plan bikin û Konferans di pîrsa bêçekkirina PKK-ê de asê nebe.

Newroz li London, Hamburg, Kopenhagen, Rûsya, Awustîrya û gelek welatê din yê kurdistanî li dijî hat pîrozkirin. Pîrozbahiyên London û Kopenhagenê jî aliyê KOMKAR-ê ya Hamburgê jî ji aliyê Platforma Kurdên li Hambûrgê hat lidarxistin.

Li Hamburgê dostên kurdan yê biyanî jî bihêz û coş beşdarî pîrozbahiya Newrozê bûn û piştgiriya xwe bi gelê kurd re diyar kir. Di pîrozbahiya weka şevêka bi xwarin û vexwarin hatibû lidarxistin de; li ser navê Platformê M.Elî Yildirim, li ser navê SPD-ê Michael Neumann, li ser navê CDU-yê Steffen Muller, li ser navê Partiya Keskan Andreas Waldovsky li ser navê Partiya Çep mafparêz û dostê kurd Prof. Norman Paech nûnerên birêvebiriya bajêr bi axaftin û peyamên xwe dostanî û piştgiriya xwe ya bi doz û gelê kurd re pêşkêş kir.

Hejayî gotinê ye ku hê him li hin bajar û navçeyên Kurdistanê û him jî li dervayî welêt pîrozbahiyên Newrozê berdewam dikin.



Çi biçûk çi mezin, çi kal û çi gênc amedî weka hesak di vê Newrozê de jî bi coş bûn



Şivan jî li Newroza Hanoverê bû



Li Hamburgê dostên kurd amade bûn



Waniyan silav li amediyên kir



HAK-PAR-ê di salonekê de Newroz pîroz kir



Cara yekê ye ku li Ruhayê Newroz ewqas bi girseyî tê pîrozkirin